

Nûçe û Çalakî

**Koçbarkirina kesayetiya welatparêz
Hecî Mihemedê Meşayix**

Êvara şemîya 28/5/2011an, Hecî Mihemedê Meşayix koça xwe ya dawîn ji nav me bar kir û çû ber dilovaniya Xwedê. Buhîştî di sala 1924an de li gundê Girşêran, herêma Tirbesipiye ji dayik bûye û temenê xwe di nava gel de buhurandiye û bûye hevparê derd, êş û xemên wî.


Di rojên pêşî ji damezrandina Partiya Demoqrata Kurd li Sûriyê de, rehmêtî derbasî rêxistinê bûye. Berî damezrandinê jî, wî di gelek komcivînê **rêxistina yekemîn de, li** herêma Tirbesipiye beşdar



bûye. Rehmêtî di gihandina alîkariyê bo şoreşa Kurdistanê Îraqê de, xwedî rolek xuya û berz bû. Herweha wî bi xwe radyoya Kurdistanê ji Helebê gihandiye Tirbesipiye û ji wir jî derbasî Kurdistanê Îraqê kiriye. Gorbuhuşt yek ji endamên şanda Kurdî ya ku çûbû Kurdistanê Îraqê piştî vegera nemir Mele Mustefa Barzanî ji Yekîtiya Sovyêt.

Rehmêtî roleke civakî erênî di nav gelê xwe de, li herêma Tirbesipiye bi hemî reng û beşên xwe ve leyistiye, û rewşa tevgera kurdî û ya Kurdistanê ta rojên xwe yê dawî şopandiye.

Bi navê komîta rêvebir a kovara Newrozê, em sersaxiyê ji malbata wî re dixwazin û em bi hêvî ne, ku cihê wî buhîştta rengîn be.



Nûçe û Çalakî

**Zarokê ku cîhana bijîşkiyê matmayî
kirî vedigere mala xwe**

Li Ingiltere, zarokê ku hemû organên wî ê hundir li cihê şaş bûn û li dora 40 xuleyan dilê wî rawestiyayî- yê du salî- vedigere mala xwe. Berî niha jî, Avêsta Kurd li ser vî zarokî nûçe belav kiribû. Dayîka bi navê Nataliye Boughey a 22 salî li Tebaxa sala 2009'ê zarokekî tîne dinyayê. Rojekê Nataliye ferq dîke ku henese sitandinê zehmetiyan dikêşîne. Piştî kurê xwe nîşanî Doktoran dîke, ji nû dizane ku hemû organên wî li cihê şaş in. Dayîk bi vê xeberê şaş dibe. Doktoran gotin 50 ji sedî dibe ku bijî. Bi dehên emaliyatan ji Kian re çêkirin. 2 cara dilê Kian rawestiyê. Heta Doktoran got ku Kian miriye û malbata Kian amadekariya veşartina wî kirin. Lê, piştî li dora 40 xuleyan dilê Kian rawestiyê ji nûve bi hewldana Doktoran dilê wî kete bizavê. Niha jî, tê gotin ,ku wê roja îne Kian ji nexweşxanê vegere mala xwe. Doktoran got ku wê Kian di nava 6 heyvan de vegere jiyana xwe a asayî